

Zimanê kurdên Tirkîyê: Pêwîstiya ramaneka nû li ser peyva zimanê kurdî

Nivîskar: Clémence Scalbert-Yücel

Wergêr ji fransî : Elî Paksîrêşt

Kurte:

Ev nivîsar, ku ji lêkolînek meydanî li Tirkîyê da pêkhatiye, peyva "zimanê kurdî" dibe jêr pirsê, ev peyv bi tiştêkî tenê îşare nake lê belê gûneyên cûr bi cûr nexş dike. Tirkîyeyê her dem, hetanî demeka nêzîk jî, hebûna zimanê kurdî înkâr kiriye û bi awayên taybet wê dike tirkî. Pol û dabeşên rojavayî hebûna zimanê kurdî nîşan didin. Mîrov zimanên gellekî nêzîk lê malbatên cuda dibîne ku axêverên wan xwe kurd didin nasandin. Pes, pênasînên zimannasî û civakî ji tiştê ku wek "zimanê kurdî" ye, her dem li hev du nakin. Têvelîtî û gûnegûniya zimanî girîng e: Derketina tevgerên neteweperwer û hewldanên sa standardkirinê ew xurtir kiriye. Yekkirina zimanî şikest xwariye: Di nav welatê ku kurd tê de jîyan dikin, çendîn pîvanên kurdî derketine. Ji ber ku yekîtiya zimanî pîrr caran wek desteber û garantiya hebûna gel tê dîtin, loma warên çekdarên kurd hin siyaset, ramiyarî û gotinan pêk tînin ku mebesta wan berpekerin an nîşandana yekîtiyeka zimanî ye. Serencam, bi hîlbijartina tirkî, zimanê serdest li Tirkîyeyê, yê ku kurd zimanekî hevbeş pêk tînin.

Peyvên sereke:

Zimanê kurdî, netewe, pênase, diyarkirin, Tirkîye.

Pêşgotin:

Tevgera neteweyî ya kurd, di dirêjîya deh salên destpêkiyên sedsala 20 da hewl da ku zimanekî kurdî yê yekbûyî çêbike. Ev zimanê taybet divê bibûya zimanê amûrî yê gelê ku dê bêçêkirin û dîsan jî bibûya nîşana taybetmendiya neteweyî. Ligel vê, bi guhartinên cuda li beşên ciyawazên civaka zimaniya kurd di bin saya çendîn dewletan da (Îran, Iraq, Tirkîye, Sûriye û Soviyeta berê), dîsan jî bi siyaset û ramiyariyên zimanî yên cuda û pêkhatî ji aliyê van dewletan va, yekîtiya zimanî çênebûye. Bi pêknehatina yekîtiya zimanî, gelo îro peyva "zimanê kurdî" bi çi wateyê ye ku bi gelemperî tê bi kar anîn? Mebesta vê nivîsarê ev e ku li ser vê peyvê ji nû ve bifikire û listokên zimanî-der di diyarkirina zimanan de hûrgilî bike.

Pênasîn û navlêkirina zimanan listokek siyasî û ramiyarî di xwe de dihewîne: Ew dikarin ji bo pênasîna civakên komelî-zimanî hîkariyê dayînin ku tevgera neteweya kurd hewl daye wek netewe binase. Di rastiyê da, Billig (1997: 32,33) dinivîse:

"Di diyarkirina sînorê zimanekî da anegorî yê zimannasiyê, tiştên nediyar pirtir in. Şerrê ji bo serdestiyê ku digel çêkirina dewletan e, heman tiştê diyar di hêzê da ye ji bo pênasîna ziman [...]. Wisan xuya dike ku çalakiyên hevbeş sa navlêkirina zimanan bi rêya têkoşîn ji bo serdestiyê peyda dibe."

Gelê kurd, notila zimanê kurdî, tiştêkî diyar nîne: Ew ji komê kes pê hatiye ku agahane û bi dilxwazî girêdayî pênase ya kurdî yan kurdîtiyê ne, ku ew jî ji li ser hin "efsaneyan(O'Şea 2004) û nîşanên berzên berçavtir çêbûne ku li pênaseyên bin-kurdî serratir in. Bîrdoza ku armanca wê hevgirtin û yekbûn e gelo çawan dikare xwe digel gûnegûniya zimanî li hev bê? Wateyên siyasî û ramiyarî yên di bin wan nîşanên zimanî da çi ne? Me hewil daye li vir da, li ser nîşanên cûda yên zimanî û bikaranînan zimanî û ramiyarî li vir lê hûr bin ta ku pîrsa zimanê kurdî û lîstoka pênasînan zimanî dîsan bîn berçavgirtin; ev yek li ser lêkolînekê li Tirkîyê, li Stembolê û di navçeyên kurd, bi taybet cem kesên(nivîskar, sernivîskar, zimannas, hwd.) pêk hatiye ku ji bo amadekirin û geşdana zimanê standard(pîvan) rasterast alîkariyê didin û em ê hewil bidin nimînendeyên zimanî û her weha bikaranîna zimanî û ramiyariyên(siyasî) wê di li vir da vekolin ta ku mijara zimanê kurdî û mercên pênasînan zimannasî dîsan berçav bigirin.

1. Zimanê kurdî di qada ramiyarî ya Tirkîyê da:

Tirkîkirina "zaravayên kurdî";

Komara Tirkîyeyê ku di 1923'an da damezirî, ji tirkîkirina welêt û yekîtiya wê piştîvanî kir, gotina xwe li ser kurdan diyar kir. Gelê kurd, ziman û welatê wan, Kurdistan, tê înkarkirin. Ev peyv di dawiyê da hatin qedexekirin(anîna wan ser zimên wekî cinayet bû) û bikaranîna zimanê kurdî ji salên 1920'î va bi şidet tê tepeserkirin û peyva Kurdistan bi peyva Rojhilat(Doğu) va hatiye guhartin, piştîre bûye Anatoliya Rojhilat û di 1942'an da bûye Başûrê-Rojhilat. Nêrîna Ziman-Roj di salên 1930'yî da tê çêkirin. Ev nêrîn ku armanca wê ev bû tirkî bike dayika hemû zimanan, bi hêsani rê dide xwe ku kurdî bike "zaravayeka" tirkî. Enstîtuya Lêkolînan li ser Çanda Tirkî(Türk Kültür Araştırma Enstitüsü), ku di sala 1961'an da damezirî, di nava gellek rêxistinên fermî û wekfermî hejmarek berçav berhem li ser pîrsa kurdî weşandin. Li gor van berheman, zimanê kurdî zimanekî serbixwe nîne; tenê komê zarave ne ku rîşeya wan tirkî ye û piştî ku demeka gellekî dirêj di çiyayên Rojhelatê welêt da mane, nizim bûne û hatine guhartin û awayên wê yên cûr bi cûr ji hevdu nayên fêhmkirin. Di dabeşkirinên zimanî yên wekfermî li Tirkîyê da, zaraveyên kurdî, kurmancî û zazakî(kirmançca û zazaca) li ser zaraveyên Anatoliya Rojhilat, grûpa osmanî ya tirkî ya başûr(güney turkçesi) tên hesêbkirin.

Bîrdoza serdest ku dixwaze rêxistina zimanî ya kurdî bi tirkî va bike, piştrast dike ku ew ji wê hatiye qetîn, mirov dikare bi gotina Marcellesi(1981: 9-10) bibêje ku zimanê kurdî girêdayî tirkî ye. Di vê navebrê da, ew girêdayîbûn bi bikaranîna peyva zaraveyê pêk tê. Ev peyv îşare bi devokeka navçeyî (tirkîya Rojhilat) dike û herdem xwedî wateyeka biçûkkirinê ye.

Li gor gotara fermî, ew zarave ku ji nêzîkî 3 heya 5 hezar peyvên pêk tên û ew jî bixwe peyvên emanet ên zimanên din in ku xwedî wêje jî nîne. Bi "îsbatkirina"nebûna zimanê kurdî, nîşandana wê wekî komê peyv ji zaraveyên navçeyê yên pîrr feqîr ku peyvên guhartiyên tirkî ne, mimkinnebûna perwerdeya kurdî, nivîsîn û weşana bi kurdî jî bi dû re tê îsbatkirin(Şerefoglu û Turkozu 1982: 31, 91). Li gorî vê gotara(fermî), hemû "zaraveyên" kurdî ku gûnagûn in lê yek in: Ew tirkî dibin, tên xwar, tên biçûkdîtin û di dawiyê da tên înkarkirin. Bi vî awayî, benda 3'yan a qanûna hejmar

2932'yan a 19`ê Oktobra 1983'an li bara weşan bi zimanên din ji bilî tirkî destûr dide ku "zimanê dayikê yê hemwelatîyên Tirkîyeyê tirkî ye". Bikaranîn û zimanê yekem ên din him qedexê û hem jî namimkin e ji ber ku ew tunenin. Pes, hemû devokên kurdî di rewşeka wekhev da ne û tirkî wekî zimanê her kesî di Tirkîyeyê da bi fermî tê nasîn.

Zimanê ku li dû fermînasînê ye;

II. Navend û dorûber: Sînorên gerroke yên "zimanê kurdî"

Gûnegûniya zimanên kurdî,

Nivîskarê Şerefname(Yekemîn dîroka kurdan ku kurdekî bi farisî nivîsiye) di sedsala 16'an da dinivîse:

"Gelê kurd ji çar nijadan pêk tê ku ziman û toreyên wan ji hevdu cuda ne. Ya yekem bi navê kurmancî ye, ya duduyan lor, ya sisêyan kelhor û ya çarem goran e"(Bitlisi 1870: 27).

Wî nivîskarî gel li gor tore û ziman dabeş kiriye. Navên cûr bi cûr ku ew wek nijad bi nav dike, navên zimanan jî ne : Kurmancî, lorî, goranî û kelhorî. Şerefname dabeşbûna zimanên kurdî tîne holê û kurd jî bixwe li ser hebûna gelê kurd dupat dikan. Cigerxwîn, helbestvanê kurd, di helbesta xwe bi navê "Kîme ez ?"(1973) da peyvên Şerefname bi kar tîne.

Karên zimannasiyê tişteki din dibêjin. Murizio Garzoni yekemîn rêzimana kurdî di sala 1787'an da li Romayê weşand. Ev yekemîn berhema rêza dirêj a karên rojhilatnas û zimannasan e ku li ser şirove û dabeşkirina ziman(û / yan zaraveyên) kurdî kar kirine - divê bê diyarkirin ku ev kar jî hîn bi dawî nehatiye û herdem li ser tê nîqaşkirin û peyivîn. Îro di dabeşên zimanî yên rojavayî da, kurdî wek zimanekî îranî yê bakûrê rojava diyar dibe. Dubeşbûna zimanê îranî yê rojava bi du desteyên bakûrî û başûrî di destpêka sedsala 20'an da ji aliyê zimannasên wek Antoine Meillet yan Oscar Mann va hatiye îsbatkirin, em tenê navên van tînin. Wisan e ku mirov torenasiya zimanê kurdî diyar dike û şiroveyên li ser "zaraveyên" kurdî li hevdu zêde dibin(pircaran bi navê teknivîst) (8). Li gor nivîsên Meillet û Cohen(1981), kurdî bi du şaxeyan dabeş dibe: Devokên başûrî û kurmancî. Kurmancî bixwe dibe du desteyan: Desteya rojhilatî yan başûrî(têkildar digel navçeyên Mukrî û Sina di Îranê, Silêmanî di Îraqê da) û desteya rojavayî yan bakûrî ku devokên gûnagûn (li Tirkîyê, Ermenistanê, Îranê heya Xorasanê di [bakûrê] rojhilatê Îranê) tê da ne. Goranî û zazakî xwedî desteya zimannasiya xwe ne, ji heman malbatê lê di heman demê da ji kurdî cuda ne. Zaraveyên lorî-bextiyarî her wiha kelhorî, yên desteya başûr-rojavayê devokên îranî ne(pes ji malbateka cuda ji ya kurdî û goranî-Zazakî ne).(li paşhata 2`yan binêrin).

Li gor vê dabeşkirinê, desteyên zimannasî yên kurdî çendîn heb in, bi du malbatan dabeş bûne, yek kurmancî ye, ya din çendîn û bînav e. Ji bilî devokên başûrî, dabeşên din yên zimanê kurdî digel kurmancî şaş digirin(jêderê binêrin). Di vê yeka dawîn da, peyva "zimanê kurdî" wisan diyar e ku bi desteya kurmancî îşare dike ku Şerefname li ser dipeyive, lê ji bilî zimanên din û/yan gelên ku Bilîsî nav lê birine.

Kurmancî

Peyva kurmancî xwedî çendîn wateyan e(9). Lê dîsan, peyvên kurmanc û kurmancî bi awayekî gelemperî beramberên kurdî yên peyvên kurd û kurdî ne, ku ji erebî tîn û bi rêz îşare bi kurdan û zimanê wan dikin. Kurd(û berî her tiştî axêverên kurmancî) bi vî awayê gelemperî bi navê peyva kurmancî îşare bi kurdan dike. Ji ber nêzîkiya erdnigarî digel erebî û farsî, peyvên kurd û kurdî bi pirranî di navçeyên başûr û rojhilat da bi kar dihatin. Pes, peyva kurmancî di nivîsên kurdî di destpêka netewegeriyê, di berbanga sedsala bîstan da bo îşareya giştî bi kurdan befirêh dibe. Di kovara kurdî ya Jîn(hejmara 14, 1919) da bi zimanê kurdî hatiye îşare kirin û ev jî bi kurmanc yan kurd va yek e(kurmanc, kurd bi wateya "gel"). Lê di vê kovarê da peyva kurmancî ji bo îşare bi zimanê kurdî bi giştî nehatiye kirin. Loma divê vê peyvê bi hemete bikar bînin. Hem yek dike hem jî cuda: Çûn ku ji aliyekî va, hemû kurd dikarin wek kurmanc bîn dîtin û ji aliyekî din va kesên[kurdên] nekurmancî-axêv dikarin ji desteya kurmancî hetanî kurdbûnê derve bimînin(yan xwe dervebûyî yan jî di dervebûnê da hîs bikin). Bi her awayî, ev dervebûn tenê dikare piştê û digel çêbûna standard(pîvan) û navlêkirinên zimanan pêk bê û di rastiye da jî, peyva kurmanc di nivîsê da îro êdî jî bo axivîn jî gelê kurd bi gelemperî di Tirkiyê da bi kar nayê.

Gelo divê zazakî di desteya zimanên kurdî da cih bigire ?

Piraniya kurdên li Tirkiyê kurmancî-axêv in. Lê hejmarek berbiçav û kêmetewe jî zazakî-axêv in(10). Li gor Meillet, ev ziman ne li ser desteya kurdî ye. Dîsan, ew wekî gellek zimannasên rojava û rojhilatnas bi vê bawerê ye ku kurdî bi wateya rastîn jî zazakî cuda ye. Di sireyeka saljimêrê da, Soane (1913), Minorsky (1927), MacKenzie (1961) jî wisan encam didin-piraniya van nivîskaran zaraveyên başûrî yên ku Meillet nav lê birine jî ji desteya kurdî derdixînin. Bi vê, Soane (1913: V) vê yeka gelekî girîng zêde dike:

"Di anîna rastiye ser zimên ku ev qebîle [hemû qebileyên cîwar li Kurdistana ku wî diyar kiriye, rûpel V] gişt zimanê kurmancî diaxivin, ku zimanê kurdî ye, divê bi wan qebileyên bê îşare kirin ku di nav kurdan da dijîn, navê kurd lê hatiye kirin û zimanê wan-di nav ewrûpî û tirkan da - wek zaraveyeka kurdî hatiye navlêkirin".

Nivîskar di vir da îşare bi zaza-axêvan dike. Ew taybetmendiya zimanê wan ku li gor wî jî hêla zimanî va ne kurd in tîne holê û destnîşan dike ku ev qebîle û zimanê wan ji ber rastiya nêzîkiya erdnigarî, civakî hetanî etnikî ya van desteyan, wek kurd hatine nasîn û tîn nasîn. Navên ku li zaraveyên wan kirine li gor navçeyê cuda ne: Zazakî navê li zimanekî kirine ku axêverên wê li rojhilata Tunceli [Dêrsimê] da ne; ev bi awayekî berfireh jî aliyê hemû kurdan, axêver yan ne axêver û tirkan va bi kar hatiye. Navê Dimilî (Dimilkî) jî hêla axêverên wê va di navçeya bi taybet Sîverekê da tê bikaranîn. Du xwepeyvên watedarên din jî hene: Kirmanckî (di navçeya Tunceli [Dêrsimê]) û Kirdkî di navçeya Diyarbakir [Amed])(Blau 1989). Ew îşare bi zazakî dikin lê bi wateya zimanê kurmancan, zimanê kurdan e jî ye. (11) Wisan diyar e ku ev navlêkirin tevlêbûna axêverên zazakî di kurdîtiyê da tîne holê. Eger li gor zimannasên nav lêbirî li jorê, zazakî ne ya desteya kurdî be, lê dîsan jî axêverên wê dikarin xwe li ser civaka çandî û yan ramiyarî ya kurd bizanibin. Bi jihevcudakirina her du devokan, ev deste bixwe yan derveyî wan dikarin daxwaza dupatkirina hebûnên cûrbicûr ên çandî û yan ramiyarî bikin. Nivîsara komkî bi navê Desteyên Etnîk di Komara Tirkiyê da, van desteyên etnikiyên jêrîn dide

nîşan dan: Kurdên Sunî; kurdên elevî; kurdên êzidî; zazayên elewî (Andrews 1989). Ziman wek hêmana etnîkiya ciyawaz û bingehîn tê hilbijartin. Li nêrîneka etnîkî va, desteya zaza ji desteya kurdî tê avêtin der, tiştê ku dikare bibe lê herdem xwedan îtibar nîne. Ev sînorê zimanî ku di nav kurdî û zazakî da hatiye danîn tê ragirtin yan berfirehkirin. Fattah, zimannas, vê nêrînê ne dipejirîne ne jî red dike. Lê dîsan, ew sebebên -zimannasî- nabîne ku zazakî ji desteya kurdî cuda bike ne jî tev lêbibe. Ew di vê hîştinê da karekî rastîn dibîne ku "kurdûn" a axêverên zazakî "dîsan bîne holê". Ew dinivîse ku zazakî:

"bûye armanca bêstîqrariya ku kêman ji bo tîkiliya wê bêguneh bûye ku li ser beşek pîr kêman ji vê civakê pêk hatiye ku bi şik dest hatiye ". (Fattah 2000: 64).

Ji desteya zimanên kurdî derva hîştina zazakî dikare rêyek sa kurdî nezanîna axêverên wê bibe. Bi vî awayî, hetanî tevgerê biçûk a neteweger a zaza heye ku xwe li hember her gûne kurdûnê diparêze. Bi saya vê tevgerê, zaza bûye navê gel, Zazaistan jî navê welat; kurd [jî] jwek tirkî dagîrker tînin. Kovaên Ayre piştî Piya (duzimanî Zazakî- tirkî), ku di salên 1980 û 1990' î li Almanyayê çap dibûn, baştirîn nûnerên vê tevgerê ne. Kovarê hetanî alfabeya zazakî daye nasandin ku ji alfabeya kurdî (kurdî) cuda ye. (12)

Mînaka zazakî rê dide me ku peyva giştîya "zimanê kurdî " nisbî bikin. Sînorên ku zimannasî dide herdem digel ên ku destê diyar dikin wekhev nînin. Ji bo hêsan kirinê, navîneka kurdî ya kurmancî-axêv(li gor Meillet) heye, devokên din ên kurdî gûnegûn in lê di encamê da desteyên ji hêla zimanî va nêzîkî kurdî ne, lê ne kurd in û bi awayekî rêk û pêk xwe kurd dizanin. Loma ev sînor nermoke û guherok in.

Tevgera kurd eger ku di destpêka sedsalê 20'an da xwe geş da, xwe rûbirûyî gel û milletekî dît ku xwedî çendaniya gûnegûniya zimanî ye, pêwîstiya hebûna zimaneke yekbûyî dibîne ku gelê ku yê çêbibe bingeha xwe li ser datîne(13).

Ev standardkirin ê bi çi awayî pêk bê?

III- Derbasbûn ji zaraveyan ber bi zimanan: Nemimkîniya çêkirina zimanê kurdî

Ziman û zarave

Ziman û zarave, peyvên bi eşkereyî ramiyarî (Billg1997: 31-36), herdem ku mirov ji rewşa zimanî li ba kurdan dipeyive, tînin bi kar anîn. Loma, baştir e ku wan bînin zelalkirin.

"Ziman zaraveyek e ku ji hêla ramiyarî va serketî be "(Calvet2002: 77). Di rastî da, tu tişt nahêle, di nêrîneka bingehîn da, zimaneke ji zaraveyêkê cuda bike. Zimannasiyê ji destpêka xwe da nikariye van her du peyvên ji hevdu cihê bike (De Saussure1995: 287). Di rastiyê da, ev cudayî tenê dikare warên civakî yan ramiyarî da bînin dîtin, warên ku zimannasiya giştî li ber çav nagire. Ciyawaziya di navbera ziman û zarave da di rewşa bingehîn da ye ku bi neçarî bi dest xistine (Calvet2002: 68). Di rastiyê da, ziman hunerkarî ye.

Ji bo ku zarave bikaribe bigihîje rewşa zimên, divê pîvaneka zimannasiyê, alfabêyek, qanûnên avansiyê, rêzimanî, bikaranîna peyvî çêbike. Divê hemû karkirdên civakî yan, herî kêr, karkirdên mezinayiyê jî bidin bi wî zaraveyî: Bikaranîna di navendên dewletê, perwerde, medya(dezgehên ragihandinê), çand. Rênivîs û wêje baştirîn çêker û awayên pîvanan in. Baştirîn nûnerên wê ne jî. Sa ku zarave bikaribe wek ziman serî hilde, divê awayên zimanî yê navçeyî belav bike û ji wan dûrtir biçe, ji hêla çendanî va berfireh bibe. Ziman awayekî ser-zaraveyî ye. Îrade û vîna çêkirina zimanekî gelek caran digel çêbûna gel tê holê, lê bidesthatina rastîn a ziman tenê bi dest xistina hêza ramiyarî va dibe.

Gelê wek gelê kurd, bê dewlet, di nav sînorên xurt ên navneteweyî da perçebûyî, ku di bin ramiyariyên zimanî yê cuda ne û tehemul dikin, gelo dikare bibe xwedî zimanekî bi wateya rastîn, yekbûyî û wek alava pêwendiyar, ya ramiyarî û çandî?

Çêkirina pîvanên zimanî yê kurdî. Ber bi îstiqrara dabeşên zimanî va ?

Di sedsala 20'an da, pîrsa zimanê neteweyî hember pirhejmariya gûnegûniyên navçeyî ji bo neteweperestên kurd tê holê, Kovara Jîn (hejmara 10, 1919: 489-94) çêbûna Desteyek Kurd ji bo berfirehkirina zanist û weşîneyan îlan kir. Xalên destpêkî yê wê desteyê li bara zimên in. Li wir da, hîn pîrsa standard yan yekkirinê tune: Ev destê pêşniyar dike dersên " kurdî " bên dan, ferhengên "kurdî" çap bibin, gotinên pêşyan bên berhevkirin ku hemû "zarave " tê da xwedî cih bin(tu caran navên wan nayên kirin-rengê hîn xwedî nav nînin, eger navên wan navçeyan nebe ku tê da tîna axavtin), pirtûkên rêziman bên çapkirin. Wê desteyê ku piştî çend heyvan tê qedexekirin, nikarî bernamêyên xwe pêk bîne. Kurdsitan çênebû û pîrsa ziman bi awayekî cuda berfireh bû ku bi saya her yek ji wan dewletan e ku kurd di nav wan da perçeperçe bûne.

Di rastiyê da, li Îraqê da bû ku rêyek rastîn a standardbûna zimanî pêk hat ku rewşa ramiyarî ya bi tehemul ev yek hîşt. Kurdî bû zimanê perwerde, çapemenî û nivîsînê. Devoka navçeya Silêmaniyê bi îtibartir sa çêkirina wêjeya nivîskî, wek bingeh hat bijartin. Navê wê zaraveyê soranî ye (Hassanpour 1992). Bi vî awayî, tîkçûna di navbera civaka zimanî ya kurmançî da çêbû. Di rastî da, kurmançiya rojhilatî ji dema ku navê wê bû soranî, ciyawaz bûye. Ji bilî wê, asayîbûna ku ew mijara wê ye wê ciyawaziyê dupat dike û dadimezirîne. Kurmançî bi vî awayî ji devokên xwe yê başûrî va hat qutkirin û ev peyv tenê îşare bi kurmançî ya rojavayî dike. Ji wê demê va, peyva "kurmançî ", bêtî ku bibe sebaba şaşiyê, êdî bi rastî îşare bi hemû kurdan nake.

Ev rêya standardkirinê di hundir sînorên Îraqê da çêdibe û nagihîje kurdên Tirkîyê. Ji ber red û înkarkirina zimanê kurdî di Tirkîyê da, standardkirin hêdîtir û yekem car li derveyî welêt dest pê kiriye. Şaxeya navçeya Cizîrê (sînorên Tirkîyê û Îraqê) ye ku ji bo çêkirina zimanekî kurdî standard a (dîn) bi kar tê ku navê wê kurmançî ye (15). Bi kêr, du şiroveyên pejiranbar ji bo bikaranîna wê şaxeyê heye. Ji aliyekî va, ev navçe xwedan gelek hetanî girîngtirîn helbestvan û wêjevanên kurd e: Di wê navçeyê da rê û toreyeka wêjeyî heye. Ji aliyê din va, malbatek girîng ji çalakên neteweperestên kurd ji nifşa malbata emîrê Cizîrê, Bedirxan in. Ewan in ku ji bo çêkirina [bingehê] zimanê kurdî xebat kirine, bi taybet Celadet Bedirxan. Zaraveyeka din wek qundax-ziman serî bilind dike. Lê dîsan, vî zimanî tu rewşa fermî, tu karkirda bi îtibar bi dest nexistiye (heya sala 1991`an, axavtina ziman û teqrîben tu weşan, nebûna dibistanan, medya hwd.). Bi vî awayî, pêvajoyên dawîn ên rêya standard

kirinê ku Haugen nîşan dide (amadekirina karkirdê û pejirandina civakê) hîn divê bigihîjin encamê. Vê standardê nikariye xwe bide pejirandinê û ji ciyawaziyên zimanî yê navçeyî derbas dibin. Ev ciyawazî di Tirkîyê da mane. Ji devoka her kurdekî, mirov bi hêsani dikare bizanibe bi eslê xwe ji kîjan derê ye. Lê, ev devok bi nisbî ji hevdu fêhm kirinê jî pêk tînin.

Zimanê standard û zimanê navçeyî

Di Tirkîyeyê da, kurdî hindekî standard bûye (hîlbijartina pîvanan, rêk û pêk kirina teşeyê). Belavbûna gelekî lawaz a vê curê standardê şikeftêk hindekî girîng di navbera vî cûreyî û cûreyên navçeyî û devkî yê kurdî da çê kiriye (16). Îro, ev şikeft ji ya navbera devokên navçeyî bêtir berçav e. Di rastî da, şikefta di navber tenê, eger mirov bikaribe bibêje, şikeftêk erdnigarî ye (hin caran di nûnertiyên da dupat dibe ku axêver wek nîşana pênaseya navçeyî û ya standard, ku bi çapemenî bi rê ketiye, di Tirkîyeyê da ku kurdî demek dirêj qedexa bûye, xwedî wateyek din jî ye): Ev şikeftêk civakî, çandî, ramiyarî ye. Kesê/a ku zimanê standard diaxive, bi xwe hîn bûye, bi xwe hîn kirine yan bi hîsa erkdiyê. Endaza serdestiya wî/wê (peyv, rêzarav, hwd.) bi hêsani tê zanîn. Bikaranîna zimanê kurdî yê standard herdem karekî ramiyarî ye, tiştê ku bikaranîna devokên navçeyî û nepîvanî nînin.

Karên lêkolînê û afirandinên wêjeyî bi kurdî ji aliyê kurdên Tirkîyê li derveyî Kurdistanê dest pê kiriye. Civakokek girîng a "wêjeyî" bi taybet piştî derbeya sala 1980'î li Ewrûpayê çê bûye. Wê karên wêjeyî bi zimanê kurdî bi pêş ve xistin û piştî kurdên li Tirkîyê cîyê wan girtin (Scalbert-Yucel 2005: 282-315). Vê yekê cîyê xwe daye bi nûnertiyeka bi seyr lê di heman demê da baş. Kurmancî ya bi navê standard di Tirkîyê da pir caran li gor kesên nexwendî (bi kurdî) wek formek derveyî welêt, "Kurdiyêk Ewrûpayî" tê dîtin. Medyayên kurdî, dibistan, weşan û rojneme di sirgûnê bi taybet di (Almaniya, Swêdê) da berfireh bûne. Loma, seyr nîne ku dibînin ji "kurdiya derveyî" (yan hetanî "kurdiya televîzyonê") li beramber kurdiya Kurdistanê ya navçeyî û pir caran girêdayî awayê axaftinê, tê peyivîn. Dûriya erdnigarî jî diavêje ser dûriya zimanî.

Karên standardkirinê ji aliyê desteyên cuda cuda yê kurd, di serdem û welatên ciyawaz da hatine kirin. Di demekê da ku zimanê kurdî ya serkanî bi taybet nûner nebûye, mirov dikare dupat bike ku zimanên ciyawazên kurdî xwe damezirandine. Wisan diyar e ku standardkirin û, digel wê, navlêkirina zimanan, şikeftêk bi kêmanî nîşankî di navbera zimanên cuda yê kurdî da çêkiriye: Soranî, kurmancî, zazakî. Di Tirkîyeyê da, cîyê ku belavkirina standardan kêmsînore, devokên jî ji yê navçeyî, bi kêmanî ji hêla nirxan va, tên diyarkirin.

Pirrbûna devokan rastiyekek naskirî ye, ku hin caran li ba tevgera neteweyî va baş nehatiye pejirandin. Renge, di bersivê da hin gotar û reftar çêbibin ku armanca wan nêzîkkirina zimanên ciyawaz ên kurdî ye.

IV Ber bi yekkirina zimanên kurdan di Tirkîyeyê da ?

Gotarên yekkirinê li bara zimanan

Mînaka zazakî dîsan li vir bi mifa ye. Ew devokek navçeyî ya kurmancî li Tirkîyeyê ye ku wek zimanê standard(pîvankî) serhildaye(18); kurmancî bûye rêya hemû kurdan di Tirkîyeyê da û zaza-axêv jî tev li wê ne. Pes, cihê zazakî li ku ye ? Zazakî tu caran nehate înkarkirin, herdem di rewşeka kêlekê da bûye, di encamê di rewşa zimanê binbandorî da. Berovajî kurmancî, di zazakî da tenê berhemeka kevnare heye(19). Axêverên zazakî ji hêla hejmar va hindik in û ji hêla erdnigarî va di nav kurmancan da belav in û pirr caran bi kurmancî dipeyivin, berovajî, gelekî hindikî rast tê holê. Ev yek hindekî vî aliyê serdestiyê dide diyarkirin. Di Tirkîyê da, îro weşanên Tîj û Vate tenha weşanên pirrkar û çalakên zazakî ne(bi dehan bi kurmancî hene). Nêzîkî pêncî pirtûk ji 1991'an heya 2004'an bi zazakî hatine weşandin û çarsed jî bi kurmancî û tenê kovarek bi zazakî ye û ew jî Vate ye. Mirov dikare bibêje ku hemû kovarên bi kurmancî hin rûpelan jî bi zazakî dinivîsin an hin helbest û nûçeyan bi zazakî diweşînin. Weşanxaneyên kurdî jî wisan dikin. Her yekê teqez bi kêm pirtûkek bi zazakî weşandiye. Ev nîşaneka nimadîn(symbolic) e. Ev dihêle ku kurmancî-axêv û zazakî-axêv yek bin û zazakî-axêv jî têkevin nav kurdî-axêvan. Desthilat jî heye û zazakî bi cureyekî bi kurdî vat tê girêdan. Dîsan jî, peyvên wek kirmanckî, ne zazakî yan dimilî, ser vê yekê radiwestin ku zaza kurd in. Ev diyarde dihêle ku zazakî-axêv têkevin nav koma berfireha kurmancî-axêvan(ku di Tirkîyê da bi wateya kurdî-axêvbûnê ye û yekbûna vê komê nîşan dide.

Dîsan jî, gelek nivîskarên kurd peyvên kurmanciya jorê bo kurmancî û kurmanciya jêrê bo soranî bi kar tînin. Bi vî awayî, ev zimanan di nav peyva kurmancî da tînin komkirin û cudayiyên rastîn ên zimannasî tînin weşartin. Îro, hinek ji van zimanan bi karên pîvankirinê ji hevdu cuda bûne. Hin nivîskar jî peyva Sormancî bi kar tînin ku hewldanek e bo zimaneke durege ku bingeha wê kurmancî ye û piraniya peyvên wê soranî ne.

Ev pîrgirêka diyarkirina peyvan nîşana hebûna tirseka girîng ya pîrsgirêka ziman an zimanên neteweyî û pejiwandina pîrsgirêkdar a neteweka xwedan çendî zimanan e. Bi qasî nêzîkî sed sal pîvankarî mirov dîsan jî nikare çendgûnegiya zimanî înkare bike. Ev çendgûnegî û curbucurbûn di dirêjîya demê da çêbûye, xurt bûye û cihê xwe girtiye (ji ber karên pîvankariyê) û wisan diyar e ku bûye pîvanekê. Îro, ji hêla zimannasiyê va ne hêsan e ku mirov cudayiyên zimanî yên kurdî yek bike û ji nav ra yekî wek zimanê yekbûyî yê gel binase. Bi gelemperî, di wêjeya nûdem a kurdî di Tirkîyê da dibêjin Zimanê Kurdî û zaraveyên kurmancî, soranî, zazakî, ...Peyva zaraveyê tê bikaranîn ta ku li ser nêzîkbûn, xwedantiya hevbeş û kêmbûna cudayiyên bê rawestan(Billig 1997: 35). Bikaranîna peyva zaraveyê di nav wêjeya kurdîgera da dihêle ku her sê zaraveyên navlêbirî hevbeş bînin nîşandan an jî cureyek dabeşbûna nû ya zimannasî pêk tîne û malbata zimanên kurdî berfireh dike.

Peyva zarave piranî ji aliyê zimannasan va tê bi kar anîn: Soranî zaraveyên başûrî (wekî soraniya pîvankî), kurmancî jî zaraveyên bakûrî(wekî awayê pîvankariyê bi navê kurmancî). Li gor zimannasan, zazakî zaraveyekî kurdî nîne. Pes, bikaranîna peyva zarave bo wê ji aliyê xebatkarên kurd va li gor zimannasiyê şaş e, lê di civatê da bikaranîna wê sedemdar tê dîtin. Eger em bixwazin ji zimanên kurdî biaxivin, ji bo wê ye ku kêmtir li ser cudatiyê rawestî û zorê bidin pêvajoya pîvankariya pêkhatî di sedsala 20'an da: Di rastî da, sê zimanên(kurmancî, soranî û zazakî) hene ku li gorî rastiyên navçeyî wekî zimanên gelê kurd hatine nasîn û hîn jî tînin nasîn. Başûrî wêneyê wê sêzimanîbûna televîzyona Medya TV'yê ye. Salih Akin(1997) qala zimaneke kurdî "bi bingeha çend-zaraveyî" kiriye. Hetanî eger em hemû digel hîlbijartina peyva zarave nebin jî, hebûna wê nîşana gûnegûniyê ye: Peyva kurdî

peyveka gelemperî ye û em dizanin ku ew bi tu awayê zimanî ra peywendîdar nîne lê belê destkêma ji bo sê awayan e ku divê herdem bi nav bê diyarkirin. Pes, mirov dikare bibêje ku sê devokên kurdî hene ku hemû jî ji hêla zimannasiyê va kurdî nînin. Gotinên li bara van devokan pirr in û hin caran jî dijberî hevdu ne û li ser gotarekê û xwestekên pênasîyê-ramyarî ne.

Qedexekirin û înkarkirina devokên kurdî di demeka dirêj da bandoreka xurt daniye ser bikaranîn û derketina wan. Înkarkirin, pêşmerca tirkîkirin û helandinê bû. Li ser zimên zêde hat rawestûn: Perwerdeya bi tirkî bi riya çêkirina dibistanan û mamosteyên şandî bo Kurdistanê hat xurtkirin. Gelek kes ber bi navçeyên tirkî-axêv va hatin sirgûnkirin, gelek caran gund hatin valakirin (bi riya xerakirina gundan, bi taybet di salên 90'î da). Eger bingeha karê dubarenasînê, dubare xwedîderketina li zimên kurdî di sirgûnê da pêkhatibe, ji bo gelek kesan sirgûn bi wateya helînê jî ye. Mezintirîn bajarên kurd derveyî Kurdistanê ne, ku Stembol di serî da ye û çend milyon kurd tê da ne. Dîsan jî, zimên kurdî-jî bilî hin navendên baş bijartî- li van bajaran da kêma bi kar tê û bi tirkî ra tevlihev dibe bêtir ku kurdbûn ji holê rabe. Kesekî kurdnîjad dikare peyvekê jî kurdî nizanibe û bixwe jî neteweperestekî gurr be. Dikarin peyveka zazakî jî nizanibin lê xwe wek zaza û kurd bidin nasîn. Ev dijberiya eşkere watedar e. Eastman û Reese (1981) jî bo van zimanan peyva zimên peywendîdar bi kar anîne ku herdem bi pênasîyeka qewmî ra peywendîdar bûye. Ji bo wan, peywedkirina pênasîyê bi zimankî ra diyardeyeka pergâlî ye lê bi wateya axaftin bi wî zimanî nîne. Awayên peywendîdariya van du bingehan curbecur in. Ji hebûna zimên agahdar bûn, zanîna çend peyvên wê bo pênasîyê bes e. Di Tirkiyê da, tirkî bûye zimên rojane yê kurdan û bêtir ku kurdbûnê ji holê rabike, gûnegûnî veşartîye: Zimên peywendîdar yek ji çend gûnegûniyên zimên kurdî ye.

Dîsan jî serdestiya xurt a zimên tirkî ku pêşîya geşebûna çawanî û çendaniya pîvaneka kurdî û hejmara axêverên wê digire gefeka xurt li dijî hebûna zimên kurdî ye. Eger amûrên endazegirtina helandinê hebûna, bandora wê bi taybet di bajarên rojava û hetanî yê li rojhilatê Tirkiyê da yê pirr bibûya. Gelek kes xwe kurd dizanin lê di jiyana rojaneya xwe da tirkî wek zimên yekem bi kar tînin. Pes, mirov dikare bibêje ku helandina zimên serketîye lê helandina çandî û/yan ramyarî gelekî serneketîye.

Encam

Dijberî hemû cudayiyên zimanî, kurd piranî caran devokên xwe bi navekî diyar dikin û wan kurdî an kurmancî didin nasîn. Wisan diyar e ku ew li ser pênasîyeka hevbeş lihev dikin. Pes, peyva "Zimên Kurdî" rastîyekê nîşan dide eger jî zêdetir ji yekbûna komeka axêveran (ji gûneyên nêzîk lê cuda cuda) pêk tê ne ya bi rastî zimên. Gûnegûniyên zimaniyên ku kurdan bi kar anîne çend heb bûne, bi tevgerên pîvankirinê yê cuda cuda, cudayî jî zêde bûne, navlêkirina zimanan hatine guhartin ku nîşana dabeşbûn û cudabûnê ne. Ev yeka di demekê da ye ku neteweperestên kurd arizû dikin zimankî wan ê neteweyî hebe. Dîsan jî, belavbûna berfireha zimên serdest di Tirkiyê da zimankî din jî li ser çendîm zimên kurdî zêde kiriye û ew jî tirkî ye. Tirkî ku ji zimên kurdî zêdetir bi kar tê, wek zimên fermî bûye zimên rojane û yekem ê gelek kurdan. Wisan diyar e ku kurd bikaribe, destkêma heya demekê, bêtir zimên xwe bijî. Lê gelo, ew ê bikaribin heya çend nîşan bi kurdên tirkî-axêv berxwedanê bikin?

Çavkanî: Weşîneya langage et société (ziman û civat), hejmara 117, September 2006, rûpelên 117-140